53- Xudanê we Xuda erd û ezman di nav şeş rojan de afirandine û textê xwe ava kiriye û xistiye bin piyê xwe ,bi emre wî lez û bez ruj û şev dikevin pey hev û hev û du (…) , roj , heyv û ster jî bi emrê wî hatine xuliqandin û bindestiya wî dikin. Ma emr û ferman û xilqet û afirandin ne di destê Xuda de ne? Xuda yekê mezin û mihenk e, Xuda xudanê erd û ezmana ye

54- Ji Xudayê xwe re dizî û aşikare diayê bikin û di diakirinê de û gava ji Xuda lavekanê tiştekî ne giran bin , Xuda ji mirovên bê rêz û rêzik hez na ke.

55- Piştê ko dinya bi bawerî û edaletê çak bûye tê de fesadiyê nekin. Dilê we de tirs û hêviya kerema Xudê jê re diayê bikin, rehmet û kerema Xuda ji qencîkeran re nêzîk e. (nêzîkê qencîkera ye)

56- Dîsa bi emrê Xudê ba liba dibin,ewran tenin û mizgîniya baranê didin, û ba ewrên giran davêjin di ser erdê hişk û mirî re û pê baran dibare û zad û giya û her wekî ew ji erdê

mirî zad û giya didin gihaştin niha jî ewên mirîyan vejînin û wan jig ora wan derînin , mezinahî û qudreta Xwedê tînin bîra xwe û hêz bibin.

57- Bi destûra Xwedê hatina erdê xurt û baş çak û baş e. Û hatina qelp û qels hindik û jar e, em ayetên xwe şanî xelkê didin ta ko ew şikirdar bibin…

58- Me Nuh ji qewmê wî re rêkir û wî got: qewmê min ji Xudayê xwe re ibadet û perestişê bikin , ji wî pê ve tu Xuda nîne, ko we bi ya min nekir ez ditirsim ko hon di rojekê mejin de bi ezabekî giran wê bêne êşandin.

59- Mezinên qewmê Nûh jê re gotin: Em dibînin ko te riya xwe yekcar şaş kiriye.

60- Nûh bi wan vegerand û got : Min riya xwe şaş nekiriye, ez pêxemberê Xudanê erd û ezmana me.

61- Ez emrên Xuda şanî we didim û şîretan li we dikim û bi kerema Xwedê tiştên ko hon pê nizanin ez dizanim.

62- Ma hon ecêbmayî dimînin ko Xwedê ji kerema xwe ji we re ji we pêxemberek şandiye û ew emrên Xuda şanî we dide , we di eazbî ditirsîne.heta ko hon ji Xudayê xwe tirsiyar bibin û heke Xuda destên xwe dide bigehin rehmet û qenciya wî

63- Qewmê wî derew bi alî Nûh ve dan, me Nuh û peyayên di wî ko di pê re di gemiye de bûn ji mirinê parast û yên din ko derew bi alî ayetên me ve dane di tufanê de fetisand , ji ber ko ew kor bûn wan rastî ne didît.

64- Me ji qewmê Ad re birayên wan Hûd şand; Hûd got : Ji Xudayê xwe re perestişê bikin, Ji Xuda pê ve tu Xuda nîne, ma hon ji Xudayê xwe ne tirsiyar in?

65- Ji mezinê qewmên wî yên ko kafir bibûn gotin: em dibînin ko te riya xwe şaşkiriye û nik dilê me gava tu dibêjî ez pêxemberê Xuda me ,tu derewan dikî.

66- Hûd got: Min tu car riya xwe şaş nekiriye, Xuda ez şandim ,ez pêxemberê Xudanê erd û ezmana me.

67- Ez emrên Xuda şanê we didim û bi dilpakiyê şîretan li we dikim.

68- Ma hon zendemayî dimînin ko Xwedê ji kerêma xwe ji we re, ji we pêxemberek şandiye û ew emrê Xudanê we şanî we dide, û ji we re dibêje, ji Xwedê bitirsin ? Bînin bînin bîra, Xuda hon daniye cihe qewmê Nûh û bejn û bal û xurtiya we ,ji miletên din bilintir û zêdetir kiriye , qenciya xwedê bînin bîra xwe heye ko hon digehin rehmeta wî xelas dibin

69- Kafirên qewmê Hûd jê re gotin : ma hatina te ji ber vê yekê ye ko em bi tenê ji Xuda re ibadetê bikin û dest ji pûtên ko bavên me perestîşa wan dikirin bikişînin ? Heke gotina te rast e ka vî ezabê ko tu me pê ditirsînî şanî me bide.

70- Êdî hon misteheqê ern û ezabê Xuda Xuda bûne ? da hon bê hicet û delîlên Xwedê seba pûtên ko we û bavê we ji xwe re li gorê eqlê xwe kirine Xuda neyartiyê bi min dikin ? Xwe ne lezînin , honê bimirin, di hêviyê de bimînin, ez jî bi we re di hêviyê de bimînim.
71- Me Hûd û peyayên di wî, ko bi gora emrê dînê wî meşiya bên ji xirabiyê felitand û mirovên qewmê di wî ên din ko derew bi alî ayetên me dane û baweriya xwe ne anîne fetisand û wan ji binî qut kir.
72- Me ji qewmê Semûd re birayê wan Salih şand , wî ji qewmê xwe re got: Qewmê min ji xuda re îbadetê bikin. Ji wî pê ve Xuda nîne, Xuda ji we re delil û hicetên xwe şandiye. Ew deveya ko bi emrê xuda ji we re ji zikê zinarekê derê xistiye mucizeya Xwedê ye" berdên bila ew deveya ha di erdê Xuda de biçêre û dest bi vê ne din û jê re tu xirabiyê nekin , an ne êş û ezabekî giran bi ser we de tê.
73- Bînin bîra xwe ko Xwedê hon daniye cihê qewmê Hud û ji we re welatek da ta ko hon di deşta wî de qesra xwe ava bikin û di çîyayên wê de jî li ser terş û zinarên wê xaniyên xwe çekin , Qenciya Xwedê bînin bîra xwe ,şikirdanê Xudayê xwe bibin. Û di erdê de fesadiyê ne kin.
74- Ji qewmê salih yên ko nefsmezinî kirine ji mirovên din re ko belengaz dihesibên û baweriya xwe anî bin û bi henekî gotin : Ma hon dizanin ko Salih Pêxemberê Xudanê xwe ye û bi emrê Xuda hatiye pêxembertiyê dike? Wan got : belê em dizanin ko ew pêxemberê xudaye û me baweriya xwe pê aniye .
75- Yên ko nefsmezini kiri bûn ji bawermendan re got : wê dînê ko we pê baweriya xwe aniye em inkar dikin.
76- Û rabûn deveya ko Salih ji bo wan ji zikê zinarê derêxiayi bû şerjêkirin û gotin : lo Salih heke tu bi rast pêxemberê Xwedê yî ka ji vî ezabê Xudê ko te em tirsandin werîne!
77- Bi emre Xuda erd hejiya recfînek gişte wan ,dile wan perçiqî li ser singê xwe ketin û mirin.
78- Salih destê xwe ji wan û got : min ji we re emrên Xuda dan zanîn û şîret li we kirin. Lê hon ji şîretkeran hez na kin.
79- Lê Lût ji qewmê xwe Sedûm re got: Ma hon dixwazin neçeyî û xirabiya ko tu kes ji beriya we ne kiriye, bikin
80- Hon dev ji jinan berdidin û nêzikê mirovan dibin, hon qewmekî (…) Ziaker in.
81- Jê re cuhabê qewmê wî ev bû : Her wekî Lût dixwaze ko em dev ji kêfa xwe berdin, Lut û peyayên dê wî ji gundê xwê derînin.
82- Ji jina wî pê ve ko bi dizî kufir dikir me Lût û lêzimên di wî hemî xelas kir

83- Û me li ser qewmê wî baraneke giran û têr kevin da barîn, binêre dawiya kafirên ko pêxembertiya pêxemberên Xuda inkar dikin çito ,
84- Û me ji qewmê Medyan re birayê wan Şieyib şand . Wî ji wan re got : Yekîtiya Xuda nas bikin ji we re û ji tu kesî re ji Xuda pê ve Xuda nîne , hicet û delîlên Xwedê ji me re hatiye , di dan û standinê rast bipîvin û bikêşin heqê tu kesî nexwin! Û zerarê negîhinin wan her wekî dinya te islah kirin êdî tê de fesadiyê ne kin , heke we baweriya xwe aniye lig ora emrê min bimeşin ev ji we re çêtir e.
85- Gelê mirovîno… bi tirs , derew û hîlêbaziyê xelkê ji riya Xuda a rast şûnda we dîn vegerandin , û ne xwazin ko xelk riya xwe a rast şaş bike, û bînin bîra xwe, hon hindik bên me ji kerema xwe hon zar û zêç û rizqê we zêde kir û bînin berçavê xwe, gelo dawiya miletên ko fesadiyê kiri bûn çawan bû ?
86- Heke hin ji we baweriya xwe bi pêxemberîtiya min tînin û hinên din înkar dikin, heta ko Xwedê di nav bêra we de hikmê xwe bide sebir bikin, ji berk o hakimê çêtir Xuda ye.
87- Ji qewmê Şieyib yên ko nefsmezî kiribûn got in: Lo Şieyib … emê te û mirovên ko baweriya xwe bi te anîne ji gundê xwe derînin , meğer ko hon li ser dînê miletê me vedinin . Şieyib got : Em çawan dikan li ser dînê we vegerin , em jê ikrah dikin
88- Şieyib got : Tiştê ko Xuda me ji dînê we xelas kiriye , çawan em dikarin vegerin ser dînê we û derew bi aliyê Xuda ve bidin ; em venagerin ser dînê we meğer ko Xuda bixwaze û ji me re emir bike , zanîna Xudanê me dora her tiştî digire , me xwe sipartiye Xudanê xwe, Xuda di navbeyna me û we de hikma xwe li gora rastî û edaletê , Xudayê min hakimê çêtir û mezintir tu î.
89- Serekên qewmê Şieyib ên kafir ji yên din re got : bizanin ko heke we bindestiya Şieyib kir yekcar zerar dikin.
90- Erd hejiya dile wan perçiqî , ziravê wan qetiya û li ser rûyê xwe ketin û mirin.
91- Yên ko derew bi alê Şieyib ve da bûn helikin û (…..) qey ji mala xwe winda bûn, yên ko derew bi alî Şieyib ve da bûn di dinya û axiretê de ziyankar bûn.
92- Şieyib dev ji qewmê xwe berda û got : qewmê min…min emrên Xuda şanî we da û şîret li we kir, êdi ji bo çi ez xema miletekî kafir bixwim.
93- Gava me ji gündeki re pêxemberekî dişand û wan derew bi wê ve didan me xelkê wî gundî bi desttengî û nesaxiyê diêşand ta ku ew hîn bibin û nefsmeziniyê nekin.
94- Tiştê me ji wan re bedêla xirabiyê xweşî da û ew dewlemend bûne, wê çaxê wan dîsa nefsmezinî kirin û gotin : bav û kalên me jî lezeta xweşî û nexweşiyê tam kirine lê em ji nişka ve ezabekî giran gihande wan û wan bîr ve kirbûn ko Xuda wan biêşîne.

95- Hekê xelkê gunda baweriya xwe bianiyana û ji xuda tirsiyar bibana , me ê ji wan re rizq û qenciya erd û ezmanan bidaya, lê ew her wekî derew bi alê pêxemberên Xuda ve dane, me ew lig ora emelê wan êşandine.

96- Ma xelkê gunda hîn nabin û na tirsin ji ezabê me ko dikare bi şev gava ew radizên li ser wan de bê..

97- Ma xelkê gunda ewle ne û na tirsin ji ezabê me ko dikare di nav rojê de li ser wan de bê.

98- Ma ew çawan dikarin (…) xwedê bizanin û jê ewle bibin. jê bi tene mirovên ko eslê xwe winda , riya xwe şaş kirine ewle ne.

99- Ma yên ko cîh û welatê miletên winda bûyî girtin û mîratxwarên wan bûne bîr na bin ko heke me bixwesta em dikarîbûn cezayê gunehê wan bidin û dile wan mor bikin ta ko ew ne karin bibihîzin?

100- Em ji te re qisetên wan gundan dibêjin , ji wan re pêxemberên Xuda bi mûcîzan hatî bûn, lê wan berî hatina pêxemberan derew bi alî Xuda ve didan pişte hatina wan jî dîsa derew bi alî wan ve dan her wekî Xuda dilê wan kafiran mor kiri bûn jî dile mirovên ko baweriya xwe nayênin. Mor dike.

101- Lê me dît ko piraniya wan li ser bextê xwe ve mane. Û soz û qerara xwe şikênandine, bêtirê wan fasiq in.

102- Pişte wan me Mûsa bi ayetên me şand nik Firewun û serekên xelkê wî , lê firewun û peyayên di wî Mûsa êşand û binêre dawiya wan fesadkeran çito bû !

103- Mûsa got: Firewun , ez pêxemberê Xudanê erd û ezmana me.

104- Ez bi emre Xuda pêxemberê wî me , di heqê Xuda de rastiyê dibêjim , li bal xudanê me bi mûcizan hatim nik we , berde bila lawên Israil bi min re vegerin welatê xwe.

105- Firewun got: Heke destên te de mucize hene , û gotina rast e ka mûciza xwe şanî min bide.

106- Musa kopalê xwe avêt erdê, kopal bû marek bi rastî .

107- Destê xwe ji berika xwe derêxist destê wî rohnak bû û biriqî.

108- Mezinên xelkê Firewun gotin : ew sihirbazekî şehreza ye.

109- Gelî Qiptîyino.. ew sihirbaz dixwaze we ji welatê we derîne , tevsîra we ci ye, hon çi dibêjin ?

110- Mezinê xelkê Firewun ji Firewun re got : ji Musa û Harûn re wilo tiştik nebê (…) mirovên xwe bişîne bajarên me ên mezin…

111- Bila banî sihirbazên me ên hêja bikin.

112- Sihirbaz hatin nik Firewun û gotin heke me zora wan bir ji me re şabaşekê heye .

113- Firewun got: belê hon ji xulamokên min bibin.

114- Sihirbazan got : Mûsa… tu destpê bikî an em, kî aletên xwe ên sihrê dayne erdê ?

115- Mûsa got : hon destpê bikin û gava ew aletên sihre xwe dane erdê tirs ket dilê xelkê , ber çavê wan reş bû , qey sihrekê mezin bi ser wan de girti bû.

116- Me wehî ji Mûsa kir ta ko ew darê xwe bavîjê erdê , wî ew avêt erdê kopal bi derbekî bû şehmeran û alete sihirbazan daqurtand.

117- Rastî aşîkarbû û kirina sihirbazan a bêkêr hate seh kirin.

118- Zora sihirbazan hati bû birin, şerpeze bûn û vegeriyan ba xwe .

119- Sihirbazan secde kir .

120- Û got: me baweriya xwe bi Xudanê erd û ezmanan aniye,

121- Bi Xudanê Mûsa û Harûn.

122- Firewun got : beriya izna min we baweriya xwe bi wî anî ? Niho (…) we seh dikim, we soz û qerara xwe bi Mûsa yek kiriye. Ta ko hon qewmê vî welatî ji erdê wê derînin û bikevin welatê wan , honê bib3inin ezê çi ji we re bikim.

123- Ezê destê we ê rastê û piyê we ê çepê jê kim û piştre we hemî bi dar bikim.

124- Wan got: Binêre , emê vegerin ba Xudanê xwe.

125- Em bê sûç in, gunehê me ew e ko me baweriya xwe bi ayetên Xudanê me ko ji me re şandiye aniye û ji ber vê yekê tu tola xwe ji me hiltînî, Xudanê me , sebir bide me ,dilê me bişedîne û me misilman bimirine.

126- Mezinên qewmê Firewun jê re got: Ma tu berdidî ko Mûsa û miletê wî di vê de fesadiyê bikin û dest ji te û ji xudayên te berdin ? firewun got : emê kurê wan bikujin û dotên wan bihêlin û emê wan bixin bin destê xwe.

127- Mûsa ji qewmê xwe re got : hêvîdarên Xûda bibin û sebir bikin, evden dinê miletê Xuda ne, bi gora daxwaza xwe ji evden xwe ji kijkî re dixwaze dide, di dawiyê de yên ko ji Xudayê xwe tirsiyar in serdest dibin.

128- Wan lê vegerand û got : berî hatina te Firewun em diêşandin û piştî hatina te jî ew me diêşîne . Musa got : hey eko Xuda dijminên we wê bifetisîne û erdê wan bide we lê dixwaze berî her tiştî we biceribîne û emelê we nas bike.

129- Me av , baran û zad û fêkiyên miletê Firewun kêm kir û ew pê şidand ta ko çavê xwe vekin û fêr bibin.

130- Gava miletê Firewun qenciyek didît digot : ev kedê me ye, û şikirdar nedibûn, lê gava xirabiyek bi ser wan de dihat qewmê Firewun digot : ev şeameta Mûsa û peyayên di wê ye, wan seh nedikir , ko qencî û xirabî bi emrê Xuda çêdibin, ji xwe piraniya wan nezan in tê nagehin.

131- Wan ji Mûsa re got . her çi mucize jî çêkî em bi (…) te nayên zeft kirin , û em baweriya xwe bi te nayênin

132- Ser vê me ew bi bayên xurt û lehiyên dijwar û bi belayê kulî, qimil, mişk şidand ,ava wan xwîndar kir (bi xwîn) lê wan nefsmezinî kir , ew miletê asê û gunehkar bû.

133- Gava nesaxiyeke giran bi ser wanda hat wan ji Mûsa re gotin: Mûsa… Ji Xudanê xwe ko nav beyna te û wî de ehdek heye ,ji bo me diayê bike ta ko em ji vê nesaxiyê xelas bibin , ko em jê pak bûn emê baweriya xwe bi te bînin û berdin bila lawên Israîl bi te re vegerin welatê xwe.

134- Lê gava me ew jê xelas kir û dem abi cîhanina gotina wan hat , wan bextê xwe şikênand û ew ji qerara xwe zivirîn.

135- Her wekî wan derew bi ayetên me ve dan û pê (…) me tola xwe ji wan hilanî û me ew di behra (…) de xeniqand.

136- Me lawên Israil ko di destê Firewun de jar dihatin hesibandin kirin mîratxwarên erdê rojhilat û rojavayê Şam û Misrê , welatên ko me miqedes kiriye û herwekî lawên Israîl xudansebir bên dîtin ko gotina Xuda hate cîh û me qesr û serayên bilind ko Firewn û miletê wî ava kir bûn hilweşand.

137- Me bi selametî lawên Israîl ji avê derbas kir û gava ew gihaştin welatekê ko ji pûtê xwe re perestiş dikirin nezanên lawên Israîl ji Mûsa re got: heke tu ji me re jî pûtekî weke pûtên vê miletê bianiya me ê jê re perestiş bikira. Mûsa got : we mezinahiya Xwedê seh ne kiriye ,hon miletekê nezan in;

138- Hal û dawiya wan pût parêzan xirab û emelê wan bêkêr e.

139- Mûsa ji lawên Israîl re got : Ma hon ji Xuda pê ve Xudayekê dixwazin, Xuda we ji hemî miletên din çêtir girtiye.

140- Bînin bîra xwe … me hon ji destê Firewunê ko zor li we dikirin, kurên we dikuştin û dot û keçên we dihiştin xelas kir; Xuda hon bi wan ezabên giran bi hewayekê diceriband.

141- Me ji Mûsa re sîh şev mihlet dabû heta ko (…) bigire û piştre me jê re deh şevên din jî mihleta da, pê mihleta wî timam kir û Mûsa ji birayê xwe Haron re got : tu bibe nîmênendeyê min , qene be qenciyê bike û ne keve riya fesadkaran.

142- Gava mihletê Mûsa timam bû û deng û axaftina Xuda bihist got: Xudayê me ji kerema xwe berdê ezê te bibinim . Xuda got : tu nikarî min bibînî lê mezeke pêşiya xwe , wî çiyayê dibînî ,heke ew çiya cîhê xwe de awa tu jê min bibînî , û gava Xuda di ser çiyê re derbaz bû çiya perçiqî,dengekî mezin ji çiya hat û ji tirsa dilê Mûsa borî û ket erdê ,gava ew bi hişê xwe hat got: Xudanê min ê mezin , min (…) kiriye ko tu nayê dîtin ,ez tobedar bûme û bawermendê pêşîn ez im.

143- Xuda jê re got : Mûsa bê vê axaftina min û te û bê pêxembertiyê min tu ji hemî mirovan çêtir girtiye ; tiştên ku ez ji kerema xwe didim te bike û ji şikirdaran bibe.

144- Me ji bo Mûsa di tewratê de li ser her tiştî şîret û pendên me û hikmên dîn û dinyayê bi tefsîla wan nivîsandiye ; Mûsa tu wan bi dilekî xurt û pak bibe û ji qewmê xwe re emir bike. Bila ew jî li gora hikmên Tewratê bimeşin. Ezê dawiya fasiq û gunehkaran şanî we bidim.

145- Ezê yên ko di danyayê de bê rê xelkê diezibînin û nefsmeziniyê dikin, na gihînim ronahiya ayetên xwe , ji xwe ew hemî ayet û delîlan bibinin jî baweriya xwe bi wan nayînin ,riya rastî û çeyiyê pêş xwe de peyda bikin jî nakevinê (tê de na meşin ) heke reyeke xwar dibînin dikevinê , ji berk o wan derew bi alî ayetên me ve dane û bala xwe nadine riya rastiyê, bîr nabin, jê bêhay in.

146- Yên ku derew bi aliyê ayetên me ve dane û roja axiretê înkar kirine emelê wan ên qenc jî di axiretê de bi kêrê wan nayê. Ewê bi gora kedê xwe berpirsiyar bibin û ezebê bikişînin

147- Tiştê ko Mûsa çû çiyê tûrê û ji xwadê xwe re îbadet dikir qewmê wî ji miletê Fîrewn bi emanete heykelekê golikekê bûn, golik bi awayekî hati bû çêkirin ko ji deve wê deng dihat. Ma wan nedidît û bîr nedibûn ko wê golikê bi wan re xeber nedida û nikarî bû riya rastiyê şanî wan bide; lê wan ew ji xwe re kir Xuda û ji zaliman bûn.

148- Gava ew ji ibadeta golikî poşman bûne û wan seh kir ko riya xwe şaş kir wan got : heke rehmet û piyaniya Xuda ne gihe me û Xwedê dê gunehên me ne bore em ji ziyankaran dibin.

149- Gava Mûsa vegeriya ba qewmê xwe evirî û xemgîn bû , gote wan : pişte öûna min we çi îşekî xirab kir , hon çima hevîdarê emrê Xudayê xwe û vegera min ne mane ? mûsa rûpelên Tewratê danê erdê û destê xwe avêt porê birayê xwe girt û ber xwe kişand, Harûn got: kurê diya min ,miletê min ez jar kirim , wan ez bikuştama, qedrê min neşkîne û ber nede ko xelk bi hev ketina me şabibin, û ji min ne xeyide û bawer neke ko ez ji zaliman im.

150- Mûsa got: d. gunehên min û birayê min bibore û me bigihîne Xudanê min . rehm û pêyaniya xwe, yê dilovantir tu î.

151- Yên ko golik birin û ji xwe re kirin Xuda di axiretê de bi ezabî Xuda wê bêne êşandin û di dinyayê de jî sefîl û şepeze bibin. Xuda cezayê derewkeran bi vî awayî dide.

152- Lê yên ko xirabî kirine û piştre tobedar bûne û baweriya xwe anîne divê bizanin ko Xudanê te di gunehên tobedaran dibore,Xuda dilo(van e)

153- Tiştê ko erna Mûsa borî , rûpelên Tevratê hilanî, di wan rûpelan de ji bona mirovên ko ji xudanê xwe tirsiyar in mizginiya efî û rehmeta Xuda û riya rastiyê nivîsandî bûbû.

154- Mûsa di dema ko me jê re emir kiri bû ji qewmê xwe kafir mirov bijartin, û gava ew mirovên ha ketin recfînekekî giran Mûsa got : Xudanê min ,heke te bixwesta bere jî, gava ko wan ji golikê re ibadet dikirin , dikarî bû min û wan bifetisînî, gelo seba gunehkariya qewmê me dixwazî me biedimînî nezaniya wan. Emre te ye, te dixwest û ew nezan wan bi hikmên xwe riya her kesê ko dixwazî şaş dikî û her kesê ko dixwaze digîhîne ser riya rastiyê, delil û sermîyanê me tu ê, di gunehên me biborîne ,me bigîhîne dilovaniya xwe , efikarê çêtir tu î .

155- Ji kerema xwe di dinyayê û axiretê de qencî û xweşiyê bike para me, emê vegerin ba te. Xuda got : ez bi ezabê xwe her keşê ko dixwazin diêşînim û rehm û piyaniya min dora her tiştî digire, ezê di gunehên mirovên ko j imin ditirsin zekatê xwe didin û baweriya xwe bi ayetên min anîne biborim,ew ji rehm û piyaniya min (di fotokopiye de derneketiye. S. Ulugana )

156- Yên ko bindestiya pêxemberê min Muhamed- ko bi xwe nezan e lê bi wehyên min riya rastiyê şanî xelkê dide- dikin û ji xwe wan di kitêbên xwe Tevrat û Încîlê de delîlên hatina wî dîtine ,bila bizanin ko Muhamed ji wan re bi kirina qenciyê û bi ne kirina xirabiyê emir bike û xwarina tiştên baş ji wan re helal û xwarina tiştine kirêt û kirina tiştên bêkêr ji wan re heram bike û hikm û qeydeyên dînê wan ên giran sivik bike. Yên ko baweriya xwe bi Pêxembertîya wî tînin , qedrê wî digirin (…) kuştinê de arikariya wî dikin û bi gora emrên Qurana ko jê re hate dahatin dimeşin ew ji ezabê dojehê xelas dibin û digehîn buhuştê.

157- Pêxemberê min bêje : Gelî mirovino… ez pêxemberê Xuda me û ji bo we hemiyan hatime , Xudayê ko xwediyê milkê erd û ezmana ye ,ji wî pê ve tu xuda nîne , yê ko sax dike vedijîne û yê ko dimirînê ew e, ji baweriya xwe pê xuda û pêxemberê wî yê ko bi xwe nezan e û bi wehyên Xuda riya rastiyê şanî xelkê dide- bêmin her wekî

pêxember jê baweriya xwe bi Xwedê û emr û kitêbên wî aniye, bindestiya P3exember bikin li gorê emrên wî bimeşin ta ko hon bigehin riya rastiyê.

158- Ji kewmê Mûsa birek ? heye ko xelkê digehînin riya rastiyê û li gora emre Xuda dimeşîn û hikmê xwe lig ora edaletê didin.

159- Me lawên Israîl ku dwanzde bin û her yekê ji wan bû miletekê mezin , gava Mûsa ji bo xelkê xwe av xwest , me jê re wehî kir û got : bi çoyê xwe liv î kevirê bide ,wî bi çoyê xwe lê da, ji nişkê ve ji wî kevirî duwanzde kanî der bûn û her birê xelkên Mûsa delavê di xwe nas kir û me di germiya deşta Sihê de bi ewrê sîh da we û me ji we re gezû û kutefir da dahatin û me destûra xwarina wî zad3e çak da we , we bi serhişkiya xwe zilm ne li me, lêbelê li nefsa xwe dikir.

160- Bînin bîra xwe, me ji we re got : bikevin vî gundê û ji zadên wî bi qasê daxwaza xwe bixwin , ji deriy3e w3e li ser çokan derbaz bin û bi poşmanî bibin tobedarên gunehên xwe ta ko Xwedê jî toba we qebûl bike , ji ber ko xwedê xweşiya mirovên qenc bêtir dike.

161- Ji wan yên ko ezabdarê nefsa xwe bûne gotina me gohertin û pê fesadî kirin me ji ezmênan belayekê mezin li ser wan de anî ji ber ko wan zilm dikir.

162- Pêxemberê min … ji wehiyan (… ) (…) xelkê gundê leva avê bipirse , xelkê vê gundî her çend ji masîvanî di roja şemî de heram bûbû, wan masîvanî dikirin , masî bi tenê di roja şemî de nêzîkî leva avê dibûn û di rojên din de ne dihatin dîtin û me seba (…) û seba gunehkariya wan bi vî avayî diceriband û dişidand.

163- Ko bi kirina masîvaniyê gunehkar ne bibûn , şîreta nekirina mesîvaniyê dikirin got : hon li miletekî ko Xuda wê biedimîne an bi ezabekî giran dê biêşîne, çima şîretan dikin ? wan got : me bi vê hemayî mazereta xwe şanî Xudanê xwe didin, eceb hey eko xelkê gund ji xudayê xwe tirsiyar dibin û dest ji masîvaniyê dikişînin

164- Gava yên ko masîvanî dikirin guh li şîreta şîretkaran nedan me şîretkerên riya qenciyê ji nav wan xelas kirin û yên mayîn seba fesad û neçeyiya wan bi ezabekî girand êşandin.

165- Her wekî wan dest ji masivaniyê ne kişandin , ew ji rehm û piyaniya me dûr ketin û me ji wan re got : bibin meymûn û ew sefîl û şerpeze bûn.

166- Bîne bîra xwe … Xuda emir kiriye ko wehê heta roja pişdaniyê bi belayên kuştin û mihaceret û cizye û hokiyê şermiran û şerpeze bibin ,Xuda gunehkaran bez diêşîne û toba tobedaran qebûl û wan efîw dike, Xuda pizan û dilnezm e.

167- Me cuhî li dinyayê belav kirine. Hin ji wan baweriya xwe bi Bezma Muhemed anîne û ew ji qencîkeran bûne û ewên din baweriya xwe ne anîne û bawermend nebûne

, em wan carna bi qencî û carna bi xirabiyê diceribînin û wan dişidînin heta ko vegerin ser riya Xuda a rast .

168- Selfê ko piştî wan hat her çend jî ji bav û kale wan Tevrat ji wan re , ma ew hînê hikmên wê bûbûn ji bo xatirê çend peran hikmên Tevratê diguhartin digotin , Xudan di gunehên me dibore û her çi ji wan re dihat dayîn bi helal be heram be , dikirin berika xwe, ma wan li gora hikmên Tevratê soz ne da bûn ko di heqê Xwedê de rastiyê bejin û wan Tevratê de ev tişt xwendine û hikmê wê seh kirine ; bona mirovên ko ji Xudayê xwe tirsiyar in mala xweştir mala axiretê ye, gelo ew (…) bûne.

169- Yên ko bi gora hikmên Kitêbê dimeşin û nimêja xwe bi şertên wê pêk tînin divê bizanin ko ew sewabê qencîkeran winda nakin.

170- Me çiyayê Tûrê weke sîhekê giran di ser sere cuhiyan ra da sekinandin û cuhî bawerdikin ko ew çiya (…) (…) ser wan , me ji wan re got: tiştê ko em didin we bibin û bi dewleteki xurt hînê hikmên wê bibin, qedrê Tevratê bigirin, li gora wê bimeşin heta ko hon ji Xuda tirsiyar bibin.

171- Wê demê bîne bîra xwe . Heçî mirovên ko di vê dinyayê de wê bêne afirandin bi emre Xuda hatin pêşiya wî , û ( xuda ew kirin şahidê hev û du ) xuda gote wan : Ez ne Xudanê we me ? Wan got : bele ,û em şahid in ko tu Xudanê me yî Me (…) (…) ko em roja piştaniyê de ne bejin ,em (…) nehatine , em jê bêhay bûn.

172- Heta ko ew nebêjin bav û kalên me pûtên xwe dikirin hevber û hempayê Xuda , em jî çêliyên wan bûn û me jî weke wan kir ,seba gunehên bav û kalê me tu dixwazî me biezibînî ?

173- Em bi vê hewayê ayetên xwe şanê wan dikin ta ko wan dest ji kufrê berdin û ew yekîtiya Xuda nas bikin û bikevin riya rastiyê .

174- Ji cuhiyan re qiseta vê mirovê beji ko ji kitêbên xuda ,pêxembertiya Muhemed sehkir bû ,lê piştre ji dexsa xwe we ev hikmê Xuda veşart û ket pey Şeytên û har bûbû.

175- Heke we bixwesta, me (…) wê bilind dikir lê ew timakar bû, ji fesadiyê hez kir û ji riya Xuda derket ,ew mîna seyeke ko bi biqewirînîan û qevirînê zimanê xwe derdixe û weha helhelkêlikê dide û bêhna xwe distîne, û yên ko derew bi alî ayetên me ve didin jî weke wê ne ; lê wan qiretan ji cuhiyan re bibêje ta ko bibînin

176- Halê mirovên ko derew bi alî ayetên me ve dane û zalimên nefsa xwe bûne ,gelek kirête; ji çavê insan derketine, ne ji dînê Mûsa ne.

177- Her kesê ko Xuda kiriye ser riya rastiyê gihaye rastiyê û her kesê ko Xuda riya wî şaş kiriye digehe ezabekî giran.

178- Me ji bo dojehê pir cin û insan xelq kiriye , dilê wan cin û insanan heye lê rastiyê seh nakin , cavê wan heye lê delîlên yekîtî û mezinahiya Xwedê nabînin, guhê wan heye lê ayetên Quranê nabihêzin, ew mîna heywana ne û hey eko ji heywan jî kêmtir in lê pê nahesin.

179- Navên Xuda ên Spehî hene ,gava hon diayê dikin navên wî ên spehî bejin , jê re bavê Isa an navekî mîna wê lê nekin. Nekevin pey mirovên ko ketine riya xwar ,navê Xuda diguhêrin pê û bêdêvêtiyê dikin ew cezayê xwe di axîretê de wê bibînin

180- Di navbeyna miletan de ko me afirandiye miletek heye ko riya rastiyê pêş xelkê dikin û pê li gora edaletê dimeşin.

181- Lê yên ko derew bi alê ayetên me ve dan emê wan bi awayekê ew nikarin tê bigehin nerm nerm biezibînin.

182- Ez mihletekê jî didim wan lê bizane ko ew ji destê min nafilitin li gor daxwaza xwe gotina min wê bê cîh.

183- Ma ew sen nakin ko pêxember ne dîn e ,heke ew bi şev bi ern şiret li wan kiriye bîr na bin ko pêxember wan bi ezabê ditirsîne û gazî wan dike ta ko ew bikevin riya rastiyê.

184- Ma ew naxwazin çavê xwe vekin li milkê erd û ezmanan û li tiştên ko Xuda di wan de xuliqandiye nimêzin. Bi mezinahiya Xuda û bi hikmetên wî bîr bînin û bibînin hey eko dema mirina wan nêzik bûye ? Heke wan niho baweriya xwe bi Quranê neyinin gelo piştre baweriyê bi çi wê bînin.

185- Yên ko Xuda riya wî şaş kiriye bê arîkar e û kes nikare wî bigîhîne riya rastiyê ,Xuda wan di serhişkî û asêbûna wan de lal û zendemayî dihêle.

186- Ji te wê bipirsin ; ji me re dema rabûna qiyametê bibêje, bêje wan , dema wê Xuda li cem xwe daniye ji wê pê tu kes pê nizane ,ko dema wê hat Xuda şanê xelkê bide dema roja piştdaniyê ji mexlûq û erd û ezmanan ê evden xuda re nas (…) Ji wan re ew giran dihat, qiyamet ji nişkê ve wê bê, xelk ji te bipirsin û wê pê bidin erdê û bejin tu dizanî lê tu ji me vedişêrî, bêje, bi tene xuda pê dizane. Lê piraniya xelkê b3ir nabin û tê nagehin.

187- Ez nikarim qenciyê bigîhinim nefsa xwe û xirabiyê ji xwe dûr bikim, ew tu emre Xuda a li gora daxwaza wî çêdibin

188- Heke min veşartî nas bikira min ê qencî û xweşiyê bi başahi bixista destê xwe û jarî û neçeyî ji xwe dûr bikira .Ez bi tene pêxemberê Xuda me ,gunehkaran bi ezabê ditirsînim û ji qencîker û bawermendan re mizgîniya buhuştê didim. Xuda me ji nefseki ji Adem xuliqandiye ,û dîsa ji adem jina wî Hewa afirandiye û adem nêzîkî Hewa bûye

,her wekî Adem  nêzîkî jina xwe bû ye .Hema avis bû û barekî sivik hilsigirt û digeriya, gava barê Hewa  giran bû, her du ji Xudanê xwe re ibadet kirin û  gotin: heke tu ji me re zarekî pak didî em şikirdarê te dibin

189- Ku gava Xuda ji wan re  zarokekî pak da ,wan ew kir hevberê navê Xuda , lê Xuda mezin û bilind e gotina wan nagihe wî

190- Ma ew pûtên xwe  ko  nikare xelq bike,biafirine  û ji xwe  mealûq û (…) afirandin dixwazin bikin hevberê Xuda ?

191- Pût ne dikarin arikariya wan bikin  û ne jî dikarin gava tene şikestin xwe jê biparêzin .

192- Heke we banê muşrîkan dikir  û dibêjine wan bikevin riya rastiyê ew guh nadin we ,banê wan bikin ew nekin jî wan re yek e, bîr nabin.

193- Gelî mişrîkino …pûtên we ko, we kiriye hemberî Xwedê û ji Xuda pê ve ji wan re jî îbadetê dikin, bizanin ko wek we mexlûq in, heke hon dilrast in ko banê wan bikin û bila ew ji we re vegerînin

194- ma dest piyên pûtên we hene ko bimeşin,destê wan hene ko bigirin,çavên wan hene ko bibînin , guhê wan hene ko bibihîzin?Bêje banê pêutên xwe bikin , bila ew di heqê min de heçî ji destê wan tê şunda nehêlin , ez  ne ji wan , ji Xudayê xwe tirsiyar im.

195- Delîl û sermîyanê min  Xuda ye, yê ko Quran da ‘u Siltan û Padişahê bawermend û qencîkaran hemî ew e

196- Pûtên we  ko hon ji Xuda pê ve ji wan re jî ibadete dikin bizanin ko nikarin ne arikariya xwe û ne jî arikariya we bikin.

197- Gava ku tu banê wan dikî û dibêjî wan bikevin riya rastiyê ew  na bihîsin û tu mêzedikî  ko ew  li  te dimêzin, lê te nabînin.

198- Sûçên xelkê bibore ,bi pêkanîna xeyr û qenciya şîretan li xelkê bike û ji nezan û sefîlan  rîyê xwe bizivirîne dev ji wan berde

199- Heke Şeytan dixwaze te  ji riya Xuda derîne, Xuda bîne bîra xwe û arikariya wî bixwaze,Xuda bihistiyar û zana ye.

200- Yên ko ji Xuda tirsiyar in  , gava dihesin  ko şeytan wesvesayê bi wan dike,dixwaze  wan bixapîne,Xuda tînin bîra xwe ,arîkariya wî dixwazin û çavê wan vedibe, bîr  dibin û ji destê  Şeytan difilitin.

201- Şeytan birayên xwe kafiran têxin rêke şaş û ew tê de dimeşin û nikarin jê derkevin.

202- Heke tu ji wan re ayetekî nû ve anî, ew ji te re dibêjin : te çima ji xwe re ayetekî çênekir? Bêje : ayetên ko ez ji we re tînim wehyên Xuda ne ,û ez li gora emre Xuda dimeşim,ayetên Xuda ronahiya dila ye, bi wan rastî û nerastî ji hev dibin û mirovên ko baweriya xwe bi wan tînin digehin rehmet, qencî û rastiya dînê Xudê.

203- Gava Quran tê xwendin (…) , guh bidinê ,bibihîsin ta ko bigehin rehmet û piyariya Xudê.

204- Pêxemberê min , ji dil û can , bi dia û viazê ,sibê û êvarê Xudanê xwe bîne bîra xwe , jê tirsiyar bibe û bê ko dengê xwe bilind bikî ,navê wî zikir bike û ji mirovên ko Xudanê ew ji bîr bikin nebe.

205- Yên ko li ba Xuda ne , melyaketên Xuda li ber Xwedê asê nabin, nefs meziniyê nakin ,jê re dia û perestişe dikin û jixwedê re secde dikin.